Pawl Maraynis

Wergêran / Daêva

Pawl Maraynis, helbestvan û romannivîsek Hollandî ye. Li sala 1946-ê, ji dayik bûye. Bo heyamên dirêj, wek rojnamevan û redektor di rojnameya N.R.S de, kar kiriye. Heta noke du dîwanên helbestan ''Maçên Gulgulî'' û '' Gillette'' çap kirine, herwesa yek roman bi navê ''Periya Deryayê''.

Li sala 2003-yê '' Maçên Gulgulî'' xelatê (Bloemenprijs) wergirt û derbarê wê çendê Maraynis dibêje: *((Ez jî wesan bo diçim ku dîwana Maçên Gulgulî baştir e ji dîwana Gillette.))*

Ji xwandina helbestên Maraynisî, xuya dibe ku xweristeyek sîmyolojî bi ser şêwazê wî de digire çunkî ajel, dar û ber, teyr û tewal û bêcanan bi kar dihîne. Tu dibêjî qey tenê danasînek e bo wan kesan- tiştan, lê eger bi kûrayî di nav de biçî, dê bibînî ku helbestên wî pirr in ji hizr, raman, hevsozî û hestên cuda cuda di derûna mirovan de, bo nimûne viyan û neviyana tiştekê di eynî demî de, ango car dibin bingehê bedewbûnê, car jî bingehê zivêrî û bêzariyê, ev hevdijiya hest û nestan di derûna mirovan de, rengvedanek e bo rewşa wan ya pisîkolojî. Bikarhînana zimanê sîmyolojî, derbirrînek kês e bo jiyana mirovên ku bi qurnetgiriyê gemarûdayî. Maraynis vê bi mînak diselmîne: ka çawan 'Teyrê Efsûneyî' wek bûjiyekê dibîne çunkî daybavên xwe naniyase, bi tenê ye, veder e, berdewam dinalîne, bêriya hembêzê dayikê yê germ dike. Herwesa, ka çawan 'Binefşê Axrîkî' wek xerîb dibîne çunkî neçar e ku ji warekê bo yek din bar bike, wek xerîb dihê niyasîn, pêgiriyê bi bêdengiyê dike ji ber ku bi bêdengiyê xwe diparêze û bi qedera xwe qayîl bibe. Gelek ji teyr û tewalan wek hêma, bo hizr û enêdşeya mirovan, bi kar dihîne herwek quling, por û qumrî demê hindek ji wan bi bûmêr, bûjinên xembar li qelem dide çunkî wek mirovan, çaxê li ser miriyên xwe - berwext- digirîn, bi kirasên reş bejnên xwe dinixêvin. Maraynis dibêje ku cilê reş bûye mode çunkî bedew e, ne çunkî xembariyê radigehîne. Zêdebarî bo wê, helbestvan dîrok û mîtolojiyayê wek alav bo derbirrînê bi kar dihîne, mînak jî mîtelojiya axrîkî, ka çawan pare, dirav rolek giring û sereke di jiyana mirovê axrîkî de dileyzin, dibêje jî ku buhayê mirovan di samanên wan de ye, alozî û alûziya wan jî di jariya wan de ye. Ango, di navbera jîn û mirinê de, ew mirovên jar û belengaz hilawîstî dimînin û weha rojgarê dibin serî, bi gotinek din, matil û heyirî salên temenê xwe diborînin.

Macên Gulgulîn
Dîsan wê bar kir
lê, krêmê pora zêrîn
derpêkurt, pêlav û radyoya milî,
van tiştan,
li wê na zivirînim ez
dê biparêzim li nav dilî
heta ku peşêman bibe û bivegere
ew tişt,
barimte ne,
ji bo hindek macên gulgulî.